



Article

International Journal of Kurdish Studies

(ISSN:2149-2751)

4 (1), pp. 174 – 196

<http://www.ijoks.com>

*Aleksandre Jaba's Collection of Kurdish Folk Poetry Manuscripts and
"Kilamê Kîçan" of the Kurd 49*

Destnivîsên Helbesta Kurdî ya Gelêrî Yên di Koleksiyona Aleksandre Jaba de û
Nusxeya "Kilamê Kîçan" ya bi Hejmara Kurd 49ê

Mustafa ÖZTÜRK*

Received: Nov 30, 2017 Reviewed: Jan 21, 2018 Accepted: Jan 22, 2018

Abstract

Alexandre Jaba's collection of Kurdish manuscripts, which contains 54 files and 69 different works, is unique about literature, culture, history and Kurdish folklore. A certain part of the collection consists of Kurdish folk poetics. The six manuscripts in the collection are Kurdish poetry, rhythmic poetry, or folksong. Kurds 1, 2, 3, 4 and 49 from these manuscripts, although with minor differences, are generally copies of the same work or manuscript. In these works, only named "Lawîjek" Kurd 5 is a different work. In this folk literature works, important information about the language, literature, culture and life of the Kurds in the second half of the 19th century are obtained. These works, which can be accepted as a document of life at that time, also reveal the characteristics of the Kurdish folklore tradition and the culture. In this work, the Kurdish 49 manuscript is given as an example to illustrate the points described above.

Keywords: Alexandre Jaba's collection, Kurdish folk poetics, manuscript, copy.

Kurte

Koleksiyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî, ku bi tevahî 54 dosye û 69 berhemên ji hev cuda dihevine, di warên ziman, edebiyat, çand, dîrok û folklara Kurdan de xwediyê cihêkî bêhempa ye. Ji nava berhemên koleksiyonê birreke berbiçav jî, destnivîsên helbesta Kurdî ya gelêrî ne. Di koleksiyona navborî de şeş destnivîsên helbesta Kurdî ya gelêrî hene ku her şeş jî cureyên newayî ne, ango stran in. Ji van destnivîsan Kurd 1, 2, 3, 4 û 49 her çiqas hin cihêwazîyan dihevinin jî, bi gelemperî pênc nusxeyên heman berhem an destnivîsê ne. Ji van destnivîsan tenê Kurd 5 ya bi navê "Lawîjek" berhemêke cihê ye. Di naveroka van berhemên gelêrî de, derbarê ziman, edebiyat, çand û jiyana nivê duym ê sadsala 19em a Kurdan de agahiyên gelekî girîng tên bidestxistin. Ji van berheman, ku dikarin weke belgeyên jiyana wê demê bînin pejirandin, taybetiyên çand û kevneşopîya zargotina Kurdan jî aşkere dibin. Di vê xebatê de latînzekirina teksta destnivîsa Kurd 49ê weke nimûne hatiye dayîn, da ku xalên li jorê hatin behskirin bi şênberî bînin nîşandan.

Bêjeyên Sereke: Koleksiyona Aleksandre Jaba, helbesta Kurdî ya gelêrî, destnivîs, nusxe.

Recommended citation:

Öztürk, M. (2018). Destnivîsên Helbesta Kurdî ya Gelêrî Yên di Koleksiyona Aleksandre Jaba de û Nusxeya "Kilamê Kîçan" ya bi Hejmara Kurd 49ên. *International Journal of Kurdish Studies* 4 (1), 174 –196. DOI: [10.21600/ijoks.383399](https://doi.org/10.21600/ijoks.383399)

* Alk. Doç. Dr., Zanîngeha Mardin Artukluyê, Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî. E-mail: mustafaozturk@artuklu.edu.tr

DESTPÊK

*Koleksiyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî*¹, 69 berhemên her yek ji hev hêjatir dihewîne. Ev berhemên ku di hundirê 54 dosyeyan de cî digirin derbarê ziman, edebiyat, çand, folklor û dîroka Kurdan ya wê serdemê de zanyariyên jêneger pêşkêşî me dikin. Ev koleksiyona ku Aleksandre Jaba di heyama wezîfeya balyoztiya xwe ya Erziromê de berhev kiribû, bi vî rengê xwe wekî hefizeya Kurdan ya sedsala 19em e. Tevkariya vê koleksiyonê ya herî berbiçav ew e ku nusxeyên destnivîsên çand, ziman û edebiyata Kurdî yên bidestneketî veguhastine ber destên me.

Piraniya berhemên vê koleksiyonê; yan ji pirtûkxaneya şexsî ya Bazîdî derketine, yan bi destxeta wî hatine istînsexkirin û yan jî bi pêşengiya wî hatine bidestxistin. Ev yek, hevkarîya Jaba û Bazîdî ya hêja û kêrdar radixe ber çavan. Koleksiyona A. Jaba çi qasî ku koleksiyoneke destnivîsên Kurmançî be jî, di koleksiyonê de em rastî berhem û hêmanên bi zimanên Erebi, Farisî, Tirkî û Fransî jî tên. Hin destnivîs seranser bi zimanekî ji bilî Kurmançî hatine istînsexkirin, hin ji wan têkel in û di hin destnivîsan de jî hêmanên zimanên wekî din hene. Heger ji vî aliyê ve bê nixandin, dikare bê gotin ku kolaksiyoana Jaba karekî pîrziman e.

Koleksiyona A. Jaba ya destnivîsên Kurdî nêzikî tevahiya xwe, di sedsala 19em de hatine istînsexkirin ku ev dîrok ji bo destnivîsan ne heyameke pir kevin e. Ji bilî vê koleksiyonê teqez gelek destnivîsên Kurdî hebûn an jî hene; lê dema ku em bi neteweyên din re berawird dikin, çendaniya destnivîsên Kurdî ne pir zêde ne. Ev nayê wê wateyê ku Kurdan destnivîs hilneberandine, ji ber ku di dirêjahiya dîrokê de di parastina destnivîsên Kurdî de pîrgirêk zêde bûn, pir kêr destnivîsên Kurdî gihastine roja me.

Ji gelek taybetmendiyan koleksiyona A. Jaba yek jî ew e ku ev berhevoka destnivîsan ji aliyê naverok û qadên zanistê ve hêmanên curbicur dihewîne. Hejmara nusxeyên edebiyata Kurdî ya klasîk her çiqas ji yên din zêdetir bin jî; di koleksiyonê de destnivîsên têkildarî zimannasî, wergernasî, dîroknasî, antropolojî û hwd jî hene. Ji bilî van, şeş destnivîsên helbesta Kurdî ya gelêrî jî hene ku mijara vê gotarê lêkolana van destnivîsan e.

Divê bê diyarkirin ku her çiqas mijara vê xebatê helbesta Kurdî ya gelêrî be jî, ev nayê wê wateyê ku di koleksiyonê de wekî din berhemên edebiyata kurdî ya gelêrî tunene. Lewma di koleksiyonê de du nusxeyên berhema “Duru’l-Mecalîs” jî hene ku li vir neyê gotin dê kêmasî çêbibe. “... em ji arşîva Aleksandre Jaba dizanin ku Mela Mûsayê Hekarî hîn di sedsala XVIIem de zêdetirî 50 çîrokên kurdî yên gelêrî berhev kirine û ew bi navê Duru’l Mecalîs bi pexşankî nivîsîne (Perteve, 2016: 13)” Di koleksiyonê de nusxeyên Kurd 40 û Kurd 41 du nusxeyên ji hev cuda yên vê berhemê ne. Ji ber ku ev berhem pexşankî ye, di naveroka vê xebatê de nehat nixandin.

Di çarçoveya van nixandinan de, di beşa ewil a vê xebatê de şeş destnivîsên helbesta Kurdî ya gelêrî hatin berawirdkirin û têkiliyên di navbera wan de yên tesbîtkirî hatin parvekirin. Di beşa duyem de jî li ser destnivîsa Kurd 49ê hat rawestan; berê taybetmendiyan

¹ Derbarê vê koleksiyonê de bnr: Mustafa Öztürk, *Koleksiyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî (Vekolîn û Saloxdan)*, Weşanên Lîs, Diyarbekir, 2017.

vê nusxeyê yên giştî û piştê jî teksta wê ya latînzekirî hat dayîn.

1. Destnivîsên Helbesta Kurdî ya Gelêrî di Koleksiyona A. Jaba de

Di Koleksiyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî de, wekî hat gotin, 6 dosyeyên/destnivîsên bi helbesta Kurdî ya gelêrî re têkildar cî digirin. Di rêzkirina dosyayên koleksiyonê de Jaba, pênc dosye jê di serî de daye û dosyeyek jî (Kurd 49) li nêzikî dawiyê bi cî kiriye. Ne diyar e bê ka Jaba ev dosye li gor çî rêbazê bi cî kirine. Ji vê rêzkirina destnivîsên helbesta gelêrî tê xuyakirin ku ev rêzkirina destnivîsên koleksiyonê ne li gorî mijar û qada destnivîsan e.

Destnivîsên helbesta Kurdî ya gelêrî yên ku di vê koleksiyonê de cî digirin weke tablo bi vî awayî dikare bînin dayîn:

Jimare	Navê Berhemê	Mustensix	Dîroka Istînsê	Hejmara Wêrekan
Kurd 1	Istiranêd Kurmancî (Zehriye) <i>Recueil de chansons Kurdes stran, Isteranid Kurmanji</i>	?	8 Remezan 1276 (30 Adar 1860)	58 wereq
Kurd 2	Kilamê Kîçan (Zehriye) <i>Chansons Kurdes chansons ou paroles de filles</i>	?	8 Remezan 1276 (30 Adar 1860)	61 wereq
Kurd 3	Lawîjek (Zehriye) <i>Lavoujk, Héroides</i>	?	?	26 wereq
Kurd 4	Stranên Kurdî (wr. 1a) <i>Chansons Kurdes</i>	?	?	26 wereq
Kurd 5	Berîte (wr. 1a) <i>Birité</i>	?	?	32 wereq
Kurd 49	Kilamê Kîçan (wr. 1b) <i>Chansons Kurdes/Stiran/ Kelami Kitchkan</i> (wr. 1a, 25b)	Mela Mistefa	8 Remezan 1276 (30 Adar 1860)	25 wereq

Dema ku em li teşê û naveroka van destnivîsan dinêrin, rê û rêbazên hewldanên A. Jaba yên ku derbarê Kurdolojîyê de sepandine hinekî din zelal dibin, ku ji van rêbazan yek jî karê wî yê berhevkarîyê ye. Berî her tiştî divê bê gotin ku ev şeş berhemên gelêrî di encama “xebateke meydana” yan jî “karekî berhevkarîyê” de hatine bidestxistin; lewra avanî û naveroka berhemên xwe wisa nîşanî meriv didin. Di vê bidestxistina berhemên de teqez kesek an kesên “çavkanî” heye/hene. Ji bilî kesê çavkanî, kesekî ku gotin derbasî nivîsê kirine, ango mustensix heye. Di vê berhevkarîyê de kesê din jî A. Jaba bi xwe ye. Kesê çavkanî di vê berhevkarîya sêalî de gotin û helbestên xwe bi awayekî siruştî îcra kirine. Di vê kêliyê de mustensix li van gotinan guhdar kiriye û wî ew yek bi yek derbasî nivîsê kirine. Rola Jaba ya di vir de jî organîzekirina vê kiryarê ye. Her wiha Jaba, ev helbestên bi elfabeya Erebbî nivîsandî, vê dawiyê latînzê jî kirine, lewre di wereqên nusxeyan de destxeta Jaba ya latîni heye. Her çiqas, teqezkirina senaryoya vê berhevkarîyê ne gengaz be jî, di nivê duyemê sedsala nozdehem de, li herêmeke Kurdan ji aliye kesekî mîna A. Jaba yê biyanî ve xebateke meydana yan karekî berhevkarîyê, li gorî şert û mercên wê serdemê kê mîna zêde wisa dikare bê texmînkirin.

Ev destnivîsên, ku her yek jê nimûneyeke helbesta Kurdî ya gelêrî ye, xwediyê hin taybetmendiyan hevpar in. Ji ber ku ev şeş destnivîs nimûneyên gelêrî ne, daner an bêjerên wan ên ewil jî ne diyar in. Ji bilî vê yekê di destnivîsan de nehatiye tomarkirin bê ka kesê çavkanî kî ye. Heger Jaba li derekê destnivîsan kiriba ka ev helbestên stranî ji deve kê hatine guhdarkirin, belkî em îro fêrî navê çendîn îcrakerên (dengbêj, stranbêj yan hunermend) wê serdemê bibana; lê mixabin em ji vê derfeta zêrîn bêpar mane.

Her çiqas rûpelên destnivîsan wekî du sitûnan ji navê heta jêrê bi xêzekê hatibin dabeşkirin jî, her şeş destnivîs weke sitûnekê hatine istînsexkirin. Di van destnivîsan de, di her rûpelekê de bi giştî 8 rêz hene, tenê rûpelên Kurd 2yê bi gelemperî 6 rêz in. Helbet dema ku ev hejmar tên îfadekirin istisna jî di nav de ne.

Taybetmendiyan zimanê destnivîsan nîşanî me dide ku ev berhem bi kurdiya Kurmançî û bi devoka Serhedê hatine gotin/nivîsandin. Her şeş destnivîs jî bi elfabeya Erebi ya bi xeta ruq'eyê hatine istînsexkirin. Di destnivîsan de mustensix tenê rûpelên aliye rastê bi kar anîne, yên çepê vala hiştine. Meriv dikare egera vê yekê wisa rave bike ku; Jaba ev destnivîs bi taybetî ji bo xwe dane nivîsandin û bi zanebûn rûpelên rastê vala hiştine, da ku dûre wergera wan a Fransî yan jî teksta wan a latînzekirî lê binivîsîne. Di koleksiyonê de destnivîsên bi vî awayî gelek in.

Hejmara wereqên destnivîsan di tabloyê de hatibûn diyarkirin. Ji bo ku meriv hecma destnivîsan baş fam bike, divê meriv li hejmara rêzên wan jî binere, da ku ji aliye hecmê ve berawirdkirin karibe bê kirin. Li gorî tesbîtê diyar dibe ku ku Kurd 1, 435 rêz; Kurd 2, 361 rêz; Kurd 3, 202 rêz; Kurd 4, 202 rêz; Kurd 5, 458 rêz û Kurd 49 jî 362 rêz in. Ji hejmara rêzên destnivîsan bi ber çavan dikeve ku Kurd 3 û Kurd 4 yek bi yek du nusxeyên cuda yên heman berhemê ne. Helbet hevgirtina hejmara rêzên du nusxeyan tenê têrê nake ku meriv bibêje, ev her du nusxe heman berhem in; hevgirtinên wekî din jî hene ku dê li jêrê bîn parvekirin.

Balkêşiyê van destnivîsan di qeyda istînsexên wan de ye. Kurd 1, 2, 49 di heman dîrokê de hatine nivîsandin, ev yek di qeyda istîsexa her sê destnivîsan de jî hatiye tomarkirin ku wisa ne:

“Di weqtê sibê de, di 8ê Remezanê de nivîsî 1276 (Kurd 1, wr. 56b).”

“Di weqtê sibê da di heştê Remezan da nivîsî 1276 (Kurd 2, wr. 60b).”

“Mela Mistefa di weqtê sibê da di heştê Remezanê da nivîsî. 1276 (Kurd 49, wr. 24a).”

Ji van sê nusxeyan tenê di destnivîsa Kurd 49ê de hatiye diyarkirin bê mustensix kî ye; di her duyan din de weke mustensix tu nav nehatiye diyarkirin. Meriv guman dike ku her sê nusxe jî ji aliyê yek kesî ve hatibe istînsexkirin. Istînsexa van her sê destnivîsan di heman sal, meh, roj û saetê de hatine bidawîkirin; ev jî nîşan dide ku her sê nusxe jî ji destxeta heman mustensixî derketine. Dîsan ji wekhevîna dema istînsexa van her sê berheman, heger ne rasthatineke pir mezin be, xuya dibe ku mustensix di kêliya berhevkerinê de, dema

ku kesê çavkanî gotinên xwe dikir, van gotinên kesê çavkanî wekî gelaleyan tomar kirine û vê dawiyê di demeke guncav de di derbekê de ji nû ve derbasî nivîsê kirine. Helbet ev ihtîmal e; lê îzaha vê yekê tune ye ku sê berhem, di carekê de hem ji devê bêjer (kesê çavkanî) bê berhevkerin û bi paqijî weke halê dawî bê istînxekirin.

Dema ku em naveroka van nusxeyan berawird dikin te famkin ku ji bilî Kurd 5ê nusxeyên din nêzîkî hev in. Di meseleya tesbîtkirina nêzîkbûna nusxeyan de risteyên pêşî û dawiyê hêmaneke diyarker e. Nusxeyên Kurd 1, 2, û 49 bi heman risteyan hatine destpêkirin ku ev riste wisa ne:

Mala me nebû di welêtê

Di sera çiya Zerkê (Kurd 1, 2, 49: wr. 1b)

Ev her sê nusxeyên ku wek hev dest pê dikin, bi awayên cuda diqedin, ango dawiya wan ne wek hev in. Li hêla din, weke li jorê jî hatibû destnîşankirin, destnivîsa Kurd 4 û ya Kurd 3, her çiqas navên wan di koleksiyonê de cuda bin jî, ji aliyê naverokê ve yek bi yek eynî ne, heman stran in. Lê xetê nivîsê ne wekî hev in. Dibe ku mustensixê wan ango kesê derbasî nivîsê kiriye ne eynî kes be. Her du nusxe jî bi risteyên wek hev dest pê dikin û wek hev jî bi dawî dibin:

Lo dilo birc di Stenbolê sipî ne

Di sera Qeredengîz e di bin da golê bêbinî ne (Kurd 3, 4: wr. 1b)

...

Min gote qey siwarê Boke ye ji pêşî cerd û talanan zîvirî

Min nizaniya Şeytan le 'netî bû, bi min keniyane (Kurd 3, 4: 25b)

Em dikarin bibêjin ku naveroka Kurd 4ê % 90 weke strana di destnivîsa Kurd 1 û Kurd 2yê de ye, ku destpêka wê "Mala me nebû di welêt e" bû. Lê hin beşên vê lawîjekê zêde ne, di wê stranê de nebûn û li gor destnivîsên navborî cihê hin riste yan bendan cuda ne.

Ku em dubare bikin, Kurd 1, 2, 3, 4 û 49 nêzîkî hev in. Ji van jî Kurd 3 û Kurd 4 bêhtir nêzîkî hev in, li aliyê din jî Kurd 3 û Kurd 4 nêzîktirî hev in. Kurd 49 jî ji van her du birran bêhtir dişibe Kurd 1 û Kurd 2yê. Ev nêzîkbûna ku li vir tê behskirin, nêzîkbûna naverok, hecm û rêzkirina helbasta e. Li gorî van, nusxeya Kurd 5 ji yên din cudatir dixuye ku destpêk û dawiya wê jî wisa ye:

Eyşo min dibû li birca seraê

Delal min dibû li birca seraê (Kurd 5, wr. 1b)

...

Cana eger te sar e

Were bikeve nava sing û berê min zer e (Kurd 5, wr. 32a)

Di destnivîsa Kurd 5ê de du berîte hene. Di navbera her du berîteyan de 2 rûpel valahî heye û rûpela 16a jî vala ye. Mirov dikare wisa texmîn bike ku, berîteya ewil û ya duyem bi destê du mustensixên cuda hatine nivîsandin, lewma nivîsîn her çiqas bişibin hev jî, ne wek

hev in.

Di mijara berawirdkirina van destnivîsên gelêrî de xaleke girîng jî binavkirina wan e. Wekî li jor jî hat ravekirin, destnivîsên Kurd 1, 2, 3, 4 û 49 her çiqas hin cihêwaziyan bihewînîn jî kêma zêde li ser heman mijar û naverokê hatine hilberandin. Heger ev berhem ewqas nêzikî hev bin, jî bo çî navên gişan ne wek hev in? Ev pirsyareke girîng e, lê em nizanin ka A. Jaba jî bo çî teserrûfeke wisa kiriye. Dîsan jî meriv dikare hin texmînan bike.

Weke dê di tabloya jorîn de jî bê dîtîn, navên berhemên navborî weke *Istiranêd Kurmancî* (Kurd 1), *Stranên Kurdî* (Kurd 4), *Kilamê Kîçan* (Kurd 2, Kurd 49) hatine qeydkirin. Dema ku li nivîsa A. Jaba bê nêrîn dê bê dîtîn ku Jaba navê van çar berhemên bi Fransîzî “chansons Kurdes (Stranên Kurmancî/Kurdî)” wergerandiye bo Fransî. Tenê ji vê yekê jî tê famkirin ku navê berhemên bi Kurmancî her çî be jî, A. Jaba bi van navlêkrinan stranên Kurmancî qest kiriye. Di vir de tenê navdayîna Kurd 3yê ji yên din cuda ye ku navê wê bi kurmancî weke “Lawîjek” û bi Fransî jî weke “Lavoujk, Héroïdes” hatiye danîn.

Lawij, lawijok, lawje yan jî lawik ew stranên gelêrî ne ku bi formeke serbest tîn îcrakirin û li gorî destanan hinekî din kurt in. Mijarên lawijan curbicur in; lê belê bêhtir li ser şer û evîniyê tîn gotin. Ji bilî van mijarên sereke, lawijên li pê miriyan tîn honandin jî pir in (Özağaçhanlı, 2013: 795). Her weha li devera Cizîra Botan lawij, di mijarên olî de tîn stirîn. Mijara lawijan her çî be ya teqez ew e ku lawij cureyekî edebiyata gelêrî ye û cureyekî stanê ye. Jaba jî di destnivîsa Kurd 3yê de, her çiqas navê wê weke “Lawîj” nîşan dabe jî mebesta wî stran e.

Destnivîsa Kurd 5 jî weke “Berîte” hatiye binavkirin. Li Hekarî û derdora wê berîte weke şeşbendî jî tê binavkirin. “Hem ji aliyê rûxsarê hem jî ji aliyê naverokê ve straneke bihêz e. Naveroka wê ji mijarên curbicur pêk têt. Şeşbendî bi kêşe û bi serwa ne. Hem ji bo strana bendên wê ji şeş rêzan pêkhatî hem jî ji bo strana bi selîqe û awaza şeşbendiyê ya cuda tîne stirîn tete gotin. Di dîwanan de di halê rûniştinê de tîne gotin (Kaplan, 2015: 164).” Mebesta ku Jaba ev nusxe, ku ji her pênc nusxeyên din weke maverok cuda ye, tev li koleksiyonê kiriye ew e ku ev destnivîs jî wekî yên din cureyekî stranê ye.

Li gorî van raveyan tê famkirin ku A. Jaba nav, cure, teşe her çî be cureyên helbesta gelêrî yên di forma stranê de tîne îcrakirin di koleksiyonê bi cî kriye. A. Jaba dema ku koleksiyona xwe berhev kiriye di du dosyeya herî dawî de (Kurd 53, Kurd 54) derbarê destnivîsan de hin agahî û danasînen nivîsîne. Di dosyeya Kurd 53yê de A. Jaba derbarê van destnivîsên helbesta gelêrî de ku giş di forma stranê de ne, bi Fransî wisa agahî dane²:

Istiranêd Kurmancî

1. Istanêd Kurmancî. Di van stranan de beytên Gewrê û Xelîl Beg hene. Mijara van li ser evîne ne. Li kurteyê binêrin ku evînen Gewrê û Xelîl Beg tê de ne.

Kilamê Kîçan

² Ev agahiyên ku A. Jaba bi Fransî nivîsandine, Ji aliyê Sevda Orak Reşitoğlu ve bo Kurmancî hatine wergerandin.

2. Kilamên Kîçan. Ev jî stranên Kurdî ne, kilamên Gewrê û Xelîl Beg in.

Lawîjek

3. Lawik (Lawje). Stranên li ser lehengiyê.

Lo Dilo Lawîjek

4. Mînakeke din a lawjikê "lo dilo" ye. Stranên bi vî cureyî wek "dilo siwaro" têne binavkirin.

Berîtê

5. Bîrîte. Ev stran di govendê de têne gotin. (Öztürk, 2017: 150)

...

49. Kilamên Keçan (Öztürk, 2017: 155)

2. Nusxeya "Kilamê Kîçan" Ya bi Hejmara Kurd 49ê

Di vê berhemê de xala herî balkêş binavkirina wê ye. Piştî ku teksta nusxeyê şênber dibe, ev yek bêtir tê famkirin. Ji teksta berhemê derdikeve holê ku ev destnivîs ji du beşan pêk tê: Di navbera wereqên 1b-16byê de helbesta bi navê Kilamê Kîçan heye ku di heman demê de navê destnivîsê ye jî. Berhema din jî ji wereqa 16byê dest pê dike û heta dawiyê, ango heta wereqa 24ayê dewam dike.

Di helbesta Kurdî ya gelêrî de cureyekî bi navê "Kilamê Keçan" tune ye. Ev navlêkirin hebe tunebe, weke terîfkirinekê tê xuyanê; ji ber ku naveroka helbestên vê beşê li ser eşq û evîndariya keçikan e. Ev yek ji aliyê naverokê ve wisa ye; lê ji aliyê teknîkî ve jî ev beş seranser ji mînakên qewlêrkan pêk tê. Ev qewlêrkan ku di vir de cî digirin taybetmendiyên qewlêrkan kêr zêde hildigirin. Em dikarin bibêjin ku ev destnivîs, ji bo tesbîtkirina taybetiyên vî cureyê pir girîng e.

Berhema duyem ku di vir de cî digire tu tekildariyê bi berhema beriya xwe ra hîlnagire, helbesteke serbixwe ye. Weke teknîkî cureyê vî helbestê jî zêmar e, lewma bêjerê helbestê ew li ser lawê xwe (Siwaro) yê ku di şer de hatiye kuştin hilberandiye.

Di koleksiyonê de di dosyeya bi hejmara Kurd 54ê de Jaba, bi Fransî danasîna berhemên koleksiyonê kiriye. Jaba di vir de derbarê naveroka berheman de agahiyên ku ji derdorê daye hev parve kirine. Derbarê kilama Gewrê û Xelîl Begê de jî, ku di vî nusxeyê de beşa ewil pêk tîne, zanyarî parve kirine. Kurteya wergera danasîna Jaba bi vî awayî ye:

"Strana Evîne ya Gewrê û Xelîl Beg, bi zimanê Kurdî

Di van stranan de, yanî di stranên keçan de behsa evîna Gewrê û Xelîl Beg tê kirin, li derdora ku îro wek Bazîd tê zanîn. Çîroka stranê wiha ye:

Xelîl Beg, kurê Abdî Paşa yê ji malbateke dewlemend e, li Eleşkîrdê. Li cem pismamê xwe Mehmûd Paşa dijiya, yê ku di 1210'an de rêvebirê Bazîdê bû. Xelîl Beg, wextê xwe wek mîrzayekî derbas dikir. Rojekê wexta diçe nêçîrê, li ber çem keçikekê dibîne. Xweşikbûna Mîrza bala keçikê dikşîne. Navê wê Gewrê ye û ji malbateke feqîr e, ji Subhanê ye. Ji ber aramiya wê jê re dibêjin Helî, kurtasiya Helîme. Ji wê rojê pê ve Beg ji hişê Gewrê derneket. Gewrê evîna xwe bi stranan anî zimên. Piştî du salan Xelîl Beg bi evîndariya Gewrê hesiya. Piştî demekê dîsa ji bo nêçîrê hat cem wî çemê ku cara ewil Gewrê li wir dîtibû. Xelîl Beg nêçîra xwe ji bîr kir û awir berda keçikê. Ji wê rojê pê

ve ew çem bû cihê hevdîtina van her du evîndaran. Xelîl Beg dixwest ku pê re bizewice, lê şert û mercên wan li hev nedihat. Ji ber asta wan, zewaca wan jî ne mumkin bû. Ji ber wê her dem diçûn cem wî çemî û evîna xwe bi stranên ji hev re digotin, stranên ku keçikên Kurd ên îro ji evîndarên xwe re dibêjin (Öztürk, 2017: 156).”

Derbarê vê nusxeyê de, divê weke dawî bê kirpandin ku ev nusxe ligel xeta Erebî ya resen latînzekirina Jaba jî dihundirîne. Rûpelên rastê ji berhema resen a mustensix, ên çepê jî ji nivîsên Jaba pêk tê. Jaba ji bilî latînzekirinê derbarê berhemê, bêjeyên ku wateyên wan nizane, navên ci û kesan û hwd de jêrenot û nîşeyên xwe jî tomar kirine.

TEKST:

KILAMÊ KÎÇAN [wr. 1b]

Mala me nebû di welêtê
 Di sera çiya Zerkê
 Dinêra Xopana xamirpêtê
 Sed heyfî ji biskê çi çavê belek
 Malê xwe bidim serê xwe daynime ber cilêtê

Kirasê xelqê delalê şalî ne
 Qilçikê tê da ‘Erebî ne [wr. 2a]
 Ezê herim selamiya xala gerdenê
 Cotê zer memikan rîcacî ne

Dilê min mîna xana misafiran
 Tê ra dibuhurî karvanê giran
 Tirsî min ‘evdal Xwedê ew tirs e
 Ez herim welatê xerîban bimrim
 Li ser min neyê qûrîna bav û biran [wr. 2b]

Bêjna delala min zirav e, weqtê bişkê
 Ezê herim Erzeroma xopan kemerek bînim bidime piştê
 Kul bikeve mala qomsî fozûlan
 Çawan nahêlin gavek rûnê li teniştê

Hesen Paşa li jorê
 Di bin da kanê korê
 Ez xwazgîniya bişînim mala babê
 Eger neda ezê bibim bi destê zorê [wr. 3a]

Hesen Paşa li vî gazê
 Tê da diçêre beza bazê
 Ezê xwazgîniyan bişînim mala bavê

Eger neda ezê bibimê mala Cewher Axayê Berazî

Gûla baxanê bibîne
Xewa tevî Gewranê şêrîn e
Qîzê kû li malê bavê
Agirek di dilê min da dişewite
Min haj ji dilê te jê nîne [wr. 3b]

Ezê xanîkî çêkim ji rîhanê
Derîkî têkimê ji pîltanê
Ez û xelqê delalê Têlî
Tê da rûnên her sê mehê zivistanê

Ezê xanîkî çêkim li vê dûzê
Derîkî têkim ji darê gûzê
Ez û xelqê delalê Têlî tê da
Rûnên her sê mehê di têmmûzê [wr. 4a]

Ez xanîkî çêkim li vê milê
Ezê derîkî têkimê ji darê gûlê
Ez terka xelqê delalê Têlî nakim
Hetta sitêrka sibê li min hilê

Hezkirina dilan pir şêrîn e
Ne firotinê ne kîrînê
Hetta qiyametê dil bi kul e bi birîn e [wr. 4b]

Hatî karwan bergiran
Danî li hewşê di van mêran
Memkê xelqê delalê Têlî minî
Fîncanî ferfûrî dane destê wan wezîran

Hatî karwana bazirganan
Danî li çiyayê di zozanan
Memkê xelqê delalê Têlî minî fîncanî
Ferfûrî dane destê wan nezanan [wr. 5a]

Min dî li pencere, destê xwe avêtê qolana kemberê
Memkê xelqê delalê Têlî minî fîncana ferfûrî
Li Qudsê şerîf pê dixwin ava kewserê

Hatî karwanê gulan
Jê tê bêna qerefêlan
Xwedê hasil bikê

Mirazê her du dilan [wr. 5b]

Derê mala me ra buhurtî
Kuro dilê min tu girtî
Paşê te va da ve bê
Ji kesî ra nebim tu dergistî

Tu rind î mîna çira
Xwedê hebînî, ji me ra mebê bav û bira
Xwedê dizane ji bo xatirê te ez hatim vêra [wr. 6a]

Derketî stêrka karê
Şewqê dabû goliya darê
Xwedê mirazê min xelqê delal bikê
Bêrika dana vê êvarê

Evîna ser evînê
Ez û xelqê delal emê bikevin vê texmînê
Evîniya min xelqê delal mîna evînek a Mem û Zînê [wr. 6b]

Lê lê Gewrê ezê te pêşkeş kim
Li nava top di qomiş kim
Nava sîng û berê xelqê delal
Min ji kevirê mermer her ro sibana li nimêj kim

Payîzî li biharê kire gazî
Daran pelkê xwe weşandin mane tazî
Ya Reb hewara min Xwedê bike vî mirazî [wr. 7a]

Minê diyarê Sikêran
Bejna xelqê delala minê reş e, rîhana nav kevîran
Ez kawa xwe nadim bi êla Zîrkan giregirê di cebîran

Derê mala me bi gêz e
Lê diçêre berx û pez e
Derdê min axçika vêl e memkê teze

Gulê min bi mar be, pêşiya te bi dar be
Bi ku da herî istuyê te li ser min xwar be [wr. 7b]

Derê mala me bi gêz e
Lê diçêre berx û pez e

Der mala me ra tu meş meke

Ça'v li xelqê keleş meke
Xwe li ber Xwedê rûreş meke

Devî kete rê ye
Kiras û derpiyê sipî lê ye
Hêviya wê rêwî maye Xwedê ye [wr. 8a]

Ku ve tu diçî min ji bîr meke
Sêvek bide me, te di çîpa xwe ke
Tu car caran min di bîra xwe ke

Ez diçim tu dimînî, ezê sebrekê ji ku bînim
Pê dile xwe yê xerab pê bixapînim

Qomsiyan rû di reş bin
Sabûnê wan mîna heş bin
Çawan nahêlin,
Du dil bi hev ra xweş bin [wr. 8b]

Serî di sebebên
Binalin ji kezeban
Mazinê wan bimirin,
Biçûkê wan bi teban

Kurro ezê çî bikim bi malê dinê
Mushevek hatiye firotinê
Ezê ji keleşê xwe ra bikirim
Bila here ber xwendinê [wr. 9a]

Ezê herim nava hêvîdan
Bigerim ji xewê da
Ezê qurbana keleşe xwe bibim, tê ji wê da

Min dî li ser xaniyan
Min îşaret kir bi tiliyan
Ezê qurbana xelqê delal bikim
Her çar bavê Hesenîyan [wr. 9b]

Ez nexweş im were ser min
Destê min disarin pê digermin
Qîzê ku li mal bavê, tu xeber de
Bila ruh bê ber min

Êvarê çaxê henekan

Çira danîne ser tirrikan
Xelqê delalê Têlî minî kewokê gozel
Ketiye nav werdekan [wr. 10a]

Sube ye sube morê
Giya li xopana gundê me bûye torê
Xelqê delala minê xam birin dêrekê
Qarqaş bê pal û pol e

‘Aba kej û ‘aba li piştê
Tu li ser riya min rûniştî
Ji çî weqtî da te ez kirimê
Minî ma’rekî nîvkuştî [wr. 10b]

Min dî li ser xanî sekinî
‘Eba li ser milan dimekinî
Xwezîla min bizaniya tu ‘ezeb î ya bijin î

Minê diyarê Çilepaşiyân
Bejna xelqê delal li rêşiyân
Hewara min Xwedê hazir baba
Xwedê bike mirazê me her duyan [wr. 11a]

Ez bilbil im bilbilê gulê
Ezê hêlîna xwe çêkim li heyşta Mûsilê
Lawikê xwe nadim bi şêxê teyaran
Bi Zor Temir Paşa ku rûniştiye li sîka çadirê

Bejna te minarê
Bi Qulhûwallah çûme serî bi du’a hatime xwarê
Lawikê min mîna roma ‘Elo Paşa bi tibarê [wr. 11b]

Destê min kurt e nagihêje birya min
Tu were kêrek bavêje gulê min
Eger ez bi te ra neheq im, Xwedê bîne pêşiya min

Xinisa xopan derbejêr e
Kevir li bûne cûzan û kêr e
Sed heyfa min tê bi xelqê delalê Têlî
Bidine yekî kotî miskînê bêkêr e [wr. 12a]

Bejinziravê ji şimayê
Kerik reşê ji lîvayê
Tu li cem xelqê kotî romenî, li dilê min jî nayê

Min dî li ber derî livî
 'Enterî xelqê delalê şamî şevî şevî
 Sed heyfa min tê bi xelqê delalê Têlî
 Di paşîla yekî kotî da dînivî [wr. 12b]

Qîzê saê sipî li te nayê tu biderxe
 Ezê herim Erzeroma xopan
 Destekî qeytan bişkoj bînim tu li berxe
 Şevêkê min di paşîla xwe ke, evan pişkojan li ser min tev xe

Herçi kesê mal cîranê
 Sê roj sê şev dê bê xeberdanê
 Hûn ji Xwedê bizanin cenneta baqî para wanê [wr. 13a]

Bah û baran tev tê
 Şa' r û kitan li bejna te tê
 Her çi kesa ku mal cîranê çawan xwe tê

Sêvekî sor min neqîşand
 Misk û 'enber min tê hilkişand
 Îsal çend sal e
 Ji bo xatirê te min hewîşand [wr. 13b]

Kexî xweş kexî ye
 Ne qazî ye ne muftî ye
 Hesên Begê min tê da bînbaşî ye

Bejna te zirav e mîna derzî
 Ji pîra Zulfê ji para kezî
 Ezê bi qurbana te bikim Kurmancê xwedanê hezar pezî

Ez ne şa'êr im li sere te bim,
 Ne saçbaxî me li nava piyê te bim
 Xwedê mirazê me bike,
 Ezê heft salan ji te ra berdestî bim [wr. 14a]

Lawikê min pale ye
 Betana milê xwe ye
 Tirsên min ji germa havînê ji berfa çilê ye

Derdê kotî sistan
 Ew dixwarî bi gul mistan
 Sê mahê havînê te li min kir zivistan

Sêwî me sêwîkî çak im,
 Ezê şorê xwe nû seqakim
 Heft mêrê mala babê te,
 Bi miv mêrekî hesab nakim [wr. 14b]

Sêwiyo tu mebî vê xeberê
 Heft mêr ji mala bavê min biberê
 Dê te bikin şûxûlê yek xencerê

Qirmêlê xweş Qirmêlê
 Malan danî li merga şêlê
 Qîzê wan ça'v bihistir in
 Li pê koçê narin dudil in

Qîzê roja te bixêr 'eyda te binbarek
 Min seh kirî, te di ser mêra girtî yarek
 Eger ji min çêtir e li te binbarek [wr. 15a]
 Eger ji min xerabtir e, pê va bide kûremarek
 Eger mela ye, bi ser da hilşe dîwarek
 Eger akincî ye, dê biderî neyê cem barek
 Eger Kurmanc e, di malê nemîne berx û karek
 Kulla Helebê bikeve mala bavê te salê carek
 Ez tu bitene bimînin, xelq bibêje li hev binbarek

Êvar e 'ewranî rengereng e
 Domama min kutay singê
 Mukût fîrya kete li gûzeka lingê [wr. 15b]
 Ezê herim du hekîman bînim ji Ortavrengê
 Hekîmo bi 'erebê wêlî wêlî
 Bi Kurmancî hêdî hêdî
 Bi Tirkî yawaş yawaş
 Bi filleyî wûşî wûşî tu derman bikê gûzeka lingê

Bejna te ji dara hêlî
 Te bi ser xwe da berdaye pox û gû hemîlî
 Xwedê mirazê min te bikira
 Bila bi ser me da bigirta 'Erebê miwilî [wr. 16a]

Nezan bimîn nezan
 Te serê xwe girêda bi heft rengan, donzdeh terzan
 Memkê xelqê delala minî sêvê Wanî,
 Ezê bixwim li şûna çerezan

Bejna te ji dara çinarê
 Heşîn bûye li koka zinarê
 Sitûyê lawikê min xwar bûye,
 Li ber kapê xûmarê

Mûşa şewitî di gelî da,
 Dar xwar bûye ji serî da
 Mîn çawan 'emrê xwe,
 Bi 'emrê jîna jinê berda [wr. 16b]

Hatê roma bend û serê ji meydanê kirî derê³
 Hezar qawûxê romî hatî yek perê
 Şerrek bûye li Sarisûyê
 Zor 'Elî Paşa ketiye çerxê çitiyê
 Hezar siwarê romî revîn, xwe dane darê biyê

Şerrek bûye li zozanan
 Ça'v nabirre ji mij û dûmanan
 Ewqas meriv hatine kuştin,
 Teyr naxwin goştê însanan [wr. 17a]

Kela Wanê çardeh derî
 Lê digêrê Nasirê xemî cotek zerî
 Qîza Mîr Çoban xwişka Gok Axa,
 Bûye hêviya 'Elî Axa Heyderî

Hespê birayê min du dên e
 Gemê cizîrî kotî ne
 Hespê birayê min cotbicot,
 Li dergehê xwey firotine

Minî diyarê Sûtê 'eskerê lawikê min giran e bi texbûr tê
 Cewab hatiye dibê lawikê te birîndar e, talan di dû tê [wr. 17b]
 Dilo hespê lawikê min bozekî xenê
 Xelekê li 'enyê, nîşanek li gerdenê
 Siwarê min dajo qal û konê, di gêran bi tene

Dilo siwarê min siwarê mi'înê
 Ketiyê pêşiya siwaran dikşîne vê kêmînê
 Siwarê min birîndar e,

³ Ji vê risteyê heta dawî helbesta duyem e.

Kes tune deste xwe bide ser birînê

Dilo siwarê min 'egîtê siwaran,
Tu rima xwe hilîn here van diyaran
Siwarê min qenc e, Di rojê gazî û hewaran [**wr. 18a**]

Dilo tirba siwarê min li çiyê ye
Li heremê jorîn e, li ber belekê, di berfiyê
Serî li kulfetê siwarê min geriyaye ji canibe Xwedê ye

Dilo sube ye sube sar tê
Dengê nobedarî kûllî îro qewî bi min te'l tê
Meytê cindê siwarê min wa ye ber bi mal tê

Dilo ezê hespê siwarê xwe derxim ji xamê
Dest û piyan bişom ji ritamê [**wr. 18b**]
Îro sê roj e cewab hatiye hespê siwarê min şandine olamê

Dilo ez siwaran dibe'nim
Berê xwe didêmê pišta xwe jê digerînim
Ez digirim nagerim qet kesekî mina siwarê xwe nabînim

Dilo dibê li Erzeromê derketiy ferman e
Wezîro ji destê te feryad û fîxan e
Îro payîz e dibê derketiye fermana serê van xortan e

Dilo dibê dengê hespê qîr tê [**wr. 19a**]
Li serê serhedan li binê Cîzîrê tê
Cewab ji mîr hatiye, dibê lawikê te birîndar e ji cem mîr tê

Dilo dibê dengê hespê şê tê
Ji diyarê Kanê koka xopan ji çiyê tê
Xeber hatiye dibê lawikê te birîndar e ji cem paşî tê

Dilo xem xeyalê min xwanê ne
Malê me bar kirine zozanê, me xalî ne
Roja bênê rojê min dizaniya siwarê min qiyametê min nîne [**wr. 19b**]

Dilo xeman mexwe zirav nebî
Kemer li pišta te sist nebî
Herî welatê xerîban hêsîr nebî

Dilo qaz û quling û bet in
Her sê bi hev ketin,

Xerîb li welatan bêrûmet in

Dilo quling tê hew diqurîne
Li diyarê Mûşa xopan xwe datîne
Kê dîtiye ewlad here, dê û bav bimîne [wr. 20a]

Dilo go tu here, ezê tême
Menzîla te dirêj e, ê min kême
Xelq birîndarê şûr û rima ne, ez birîndarê kulê me

Kulingekî hat û buhirî
Li merg û çîmanan diêwirî
Sewta wî qulungî mîna sewta xelqê bera mirî

Dilo giyayê çîyan li min zer bû
Xelqê delalê çendî di nav da bêxeber bû
Dilê min mîna sîpana xelatê,
Mij û duman li ser bû [wr. 20b]

Dilo siwarê min siwarek dîn e
Serê xwe bi felekê ra dihejîne
Zengoyê wî zerîn, zerikê wî zêrîn e

Dilo havînê heyam dibirî
Ez bi siwarê xwe ra ketime çar û cebrê
Ez siwarê xwe ji bîr nakim hettanî ez sere xwe danim qebrê
Dilo bejna xelqê delal dibim rîhana kursê
Teterek ji teterê Stanbolî hat û pirsî
Sed heyfa min tê beça hîvbelek di bin axa sar da ditemisî [wr. 21a]

Wezîro tu bi xwe dikî kitaba mushefan bi dînekî
Bişîne Mûşê girêgiran bînî, şuxûlê xirab çêkî

Dilo ezê giliya xwe bi kê kim
Bi kekê Mîrza Begê siwarê hespê şê kim
Qutuyê evokê bişînim şuxulekî xerab çêkim

Dilo kekê Mîrza Begê rûniştiye li ser belekê
Min destê xwe jêr da avêtê etekê
Heta ez xweş im nakim terkê [wr. 21b]

Mûşa şewitî tev xulxulî
Paşî li pêşî fitilî
Pêşmêrê kekê Mîrza Begê her dikûrê Xoceyê dumilî

Dilo te çima li min wiha kir
 Te ez kirime qendîlekî bolat,
 Derê koleka li min çima kir
 Ça'vê dostan te kor kir, dilê dijminan te li min şa kir

Dilo dibê ji Helebê vir da Hama
 Darê zeytûnan heşîn bûye li berê çeman
 Siwaro tu serê xwe hilîn, kulfetê te li çolê ma [wr. 22a]

Lo lo çawîşo te malik şewitî
 Tu çima li ziyaretê natebitî
 'Ezîrê qormo miradê te,
 Kê li fermana sere te xebitî

Deşta Muşê deşte pa'n e
 Heytê hatin bi tîpa ne
 Çawîşê Hesênê Hemdanî da cotek lekan e

'Emr bera tu mede van hêlanan
 Em revîne bela kanan
 Em mîr bûna çadira sipî konê 'erebî me nedihîşt li qazanan [wr. 22b]

Mûşa şewitî li ser tîl e
 Kumê axê li kerika mêl e
 Çawîş Hesênê qaçxûn 'ezîrê devşêl e

'Omer siwarî li ca'niyê
 Ajote ser kaniyê
 Go 'Omer ez xweş bimînim,
 Ezê bighêmê bînim li şûna hemdaniyê

Siltanê ha Siltanê
 Tu şa'rê bavê ser kitanê
 Se'do, Dilo kuştine meha 'eyda remezanê [wr. 23a]

Kurdîngazî bipîvaz e
 Van çawîşan kazûkaz e
 Cewab hatiye dibê Se'do kuştine Dilo bermiraz e

Se'do û Dilo her du bira ne
 Li meydanê nav di hev da ne
 Cewab hatiye dibê hespê Se'do, Dilo mîrat mane

Se'do, Dilo ji mala mezin
Her du bi şelwarê gevez in
Siltanê rebenê, koyina cotê beran ez im [wr. 23b]

Se'do, Dilo siwarê boza gîr e
Dibê boz di bin da dixingire
Lêlî, şerê rebenê pijkirî, bavê ser cotê,
Demaçan bila toz negire

Lo lo Ne'mo, lo Ne'meto,
Bayê Rebbê 'alemê li hespê Zînê te biketo
Kuştina Ne'mo siwarê Selîm
Li welatê Xalitan bû hikumeto

Deşta Xalitan bû hewarê
Qehveçê mala Mîrza Axa qewî vedixware
Gava li Ne'mo dibû tengî tê derketa xara mala reşkalê [wr. 24a]
Deşta Xalitan bû hewarê
Qehweçê mala Mîrza Axa qehwê vedixware
Qehwekê bîne ji Ne'metê me ra birîndar e
Ji baxan heya baxan bejna Ne'mo minî
Sere sêvên şaxan gava li Ne'mo dibû tengî
Tê derketa xara mala Mîrza Axan

Deşta Xalitan bûye şîn e
Qaweçê mala Mîrza Axa qehwê digerîne
Lo lo qehwecî tu Xwedê kî tu qehwekê ji Ne'metê me ra bîne
Pêş mîrê Ne'metê min tu nîne

Li Mûşê kavir kirî li Rewanê hogaç birrî
Çawan keke horikan kete ber mirinê reng guhorî

WEKÎ ENCAM

Koleksiyona Aleksandre Jaba her çiqas bigiranî berhevokeke destnivîsên edebiyata klasîk be jî, ji destnivîsên pirtexlît pêk tê. Hebûna destnivîsên gelêrî di koleksiyonê de, ji bo qada edebiyata gelêrî derfet û zanyariyên girîng dabîn dike. Destnivîsên ku di naveroka vê xebatê de hatin vekolan, berî her tiştî bi rêya karekî berhevkarîyê hatine peydakirin. Ev karê ku Jaba rasterast li qadê kiriye yan jî daye kirin, nîşanî me dide ku karê berhevkarîya folklorê di salên 1860an de jî hatiye kirin û divê êdî em Jaba, ligel taybetiyên wî yê bêhejmar di Kurdolojiyê de, wekî berhavkarekî folklorê Kurdî jî bînin ser zimên.

Hem destnivîsa ku me teksta wê latînzê kir û hem jî yê din, derbarê serdema ku tê de hatine hilbirandin de agahiyên didin. Ev destnivîsên gelêrî ji bilî devoka Kurmancî û

edebiyata gelêrî ya herêmê ya wê serdemê; taybetmendiyên çanda gundevar, erdnîgariya welêt, têkiliyên civakî, nêzîkbûyinên nav mirovan, dab û nêrîtên herêmê û hwd di asta belgedariyê de nîşanî me didin. Heger em bi vê hişmendiyê li meselê binerin, em ji van destnivîsên wisa re nikarin bêjîn “çendîn destnivîsên edebî”; êdî xuya dibe ku ev ne tenê destnivîs in, di heman deme de tapo û belgeyên heyîna gel in jî.

Wekî di naverokê de jî bicaran hat dubarekirin, ev destnivîsên ku div ê gotarê de weke mijar hatin lêkolan berhemên helbesta Kurdî ya gelêrî ne. Çi binavkirina destnivîsan û çî nîşeyên ku di naveroka van destnivîsan de ji aliye Jaba ve hatine qeydkirin careke dinê pîrsgirêkên edebiyata Kurdî tînin bîra meriv. Her çiqas ne mijara vê xebatê be jî cihê gotinê ye ku, dîsan tê famkirin ku binavkirina cureyên edebiyata Kurdî hîn jî pîrsgirêkeke sereke ye. Dema ku Jaba di destnivîsan de têgînên “stiran”, “kilam”, “kilamê keçan”, “berîte” û “lawij” bikar aniye qesta wî çî bû? Li gorî zanîna wê rojê pênase, wate û naveroka van têgînên edebî wek îro bû ya na? Bo nimûne di teksta destnivîsa Kurd 49ê de du helbest hene; ya ewil weke teknîkî qewlêrk û ya din jî zêmar e. Lê em dibinin ku Jaba vê destnivîsê weke “Kilamê Kîçan” daye binavkirin. Gelo Jaba û kesên bi wî re xebitîne ji qewlêrk û zêmaran ne hayîdar bûn? Yan jî ev cure li wê deme û serdemê bi şiklekî din dihatin binavkarin, ya çî? Îro ev yek bi tena serê xwe, pîrsgirêka mezintirîn e di edebiyata Kurdî ya gelêrî de. Heta, heger zêdegavî nebe, ev yek pîrsgirêka giştî ya Kurdolojiyê bi xwe ye; lewma çavkaniya edebiyata Kurdî ya herî mezin edebiyata gelêrî ye.

Di vir de em dikarin “pîrsgirêken Kurdolojiyê” têxin rojeva mijarê. Necat Keskin, di gotareke xwe de (2017: 1-15) li ser pîrsgirêkên Kurdolojiyê rawestiyaye û van pîrsgirêkan weke “pîrsgirêkên teorik û têgehî” û “pîrsgirêkên dezgehî” di du beşan de senifandine û piştî jî bo çareserkirinê pêşniyazên xwe rêz kirine. Bi min ev pîrsgirêka ku li jorê hat ravekirin (binavkirin û tesbîtkirina cureyên vegotina gelêrî), dikeve nava çarçoveya her du pîrsgirêkên ku Keskin di gotara xwe de behs kiriye.

ÇAVKANÎ

Kaplan, Yaşar (2015), “Strana Kurdî (Kurmançî) Devera Hekariyan Wekî Nimûne”, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, C. 1, S. 2, s. 158-182.

Keskin, Necat (2017), “Pîrsgirêkên Giştî Yê Xebatên Folklorê Kurdî û Çend Pêşniyaz”, *The Journal of Mesopotamian Studies*, C. 2/1, r. 1-15.

Pertev, Ramazan (2016), “Tesîra Modernîzmê Li Ser Xebatên Pêşî Yê Folklorê Kurdî-Tirkî”, *Journal of University of Zakho*, Vol.4, (B) No.1, r. 12-24.

Özgaçhanlı, Zelal (2013), “Kürtlerde Sözlü Kültür ve Hikaye Anlatıcılığı: Dengbêjlik Geleneği”, *Kimlik Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler Sempozyumu Bildiri Kitabı*, Bingöl Üniversitesi Yayınları, s. 788-807.

Öztürk, Mustafa (2017), *Koleksiyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî (Vekolîn û*

Saloxdan), Diyarbekir: Weşanên Lîs.

Nusxeyên Koleksiyona Aleksandre Jaba:

Gelêrî; "Istiranêd Kurmancî", *Koleksiyona A. Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*, No: Kurd 1.

Gelêrî; "Kilamê Kîçan", *Koleksiyona A. Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*, No: Kurd 2.

Gelêrî; "Lawîjek", *Koleksiyona A. Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*, No: Kurd 3.

Gelêrî; "Stranên Kurdî", *Koleksiyona A. Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*, No: Kurd 4.

Gelêrî; "Berîte", *Koleksiyona A. Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*, No: Kurd 5.

Mela Mûsayê Hekarî; "Durru'l-Mecalîs", *Koleksiyona A. Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*, No: Kurd 40.

Mela Mûsayê Hekarî; "Durru'l-Mecalîs", *Koleksiyona A. Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*, No: Kurd 41.

Gelêrî;"Kilamê Kîçan", *Koleksiyona A. Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*, No: Kurd 49.

Jaba, Aleksandre; "Kataloga Destnivîsên Kurdî ya Aleksandre Jaba", *Koleksiyona A. Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*, No: Kurd 53.

Jaba, Aleksandre; "Danasîna Aleksandre Jaba ya Berhemên Koleksiyonê", *Koleksiyona A. Jaba Ya Destnivîsên Kurdî*, No: Kurd 54.

PÊVEK:

کلاسی کچیان

Mala me nebou dîvelite' ملا لاد بنو دیولیتد

di sera etchiya xer ke دسرا جیار زکه

di tyriya khoupana دینیرا خرابانا خامریند
 khampy pyte' ناق چمی
 chi blond trisk bouche de chevent

Sed heff ^{ji} triski chi زلف سد هف نه بنک نه جاف بلک
 tchawî belet. ojelad, boureau

Mali khe bidim seri khe' ملا به خه بدم کر بخه دیند بر جیه
 vaineme ber djelite' khe'
 khely beaute'

hirasi lîhetqi d'elali chaline' کیرانی خلیغ دلا به شالینه

qyltchiki tida arabine' گلچکی دیدار عربینه
qyltchiki manches tida y, en

a Schiyazerk' nom d'une montagne dans la province de Mouchi
 & Khampy pyte' nom d'une montagne entre et Khampy
 dans les Karas de Boursantik dependance de Mouchi

KURD 49, wr. 1b

hatta, heiya jurgu'a

Dechta khaltan bou
 hevare
 qahwetchi mala chirza aga
 qawi wedikhare,
 qahweki bire ji nameti
 mera birindare
 ji bagan heiya bagan
 bejna namo mini sivi seri
 'chagan
 sawa li namo dibou ^{بفعل}
 tenghi ti derketa
 khata mala Mirza
 agan ^(agan, n pour l'arime)

Dechta khaltan bouye' chine'
 qahwetchi mala mirza
 aga qahwi digherine'
 lolo! qahwetchi tou khoudi ki
 qahwetchi ji nameti
 mera bine'

Pych miri nameti min
 tourine

li Mouchi kawir kiri
 li Revani hughedji biri
 tehevan keti hourikan
 keti bet mirini renk
 gouhouri

temeta Molla Moutaya
 divceti soubida di
 bechta ramazani da
 nivisi 1276.

دشا خالتا بو همدار و قهوجو مالا ويزا اغا قهوجو
 binu - anin
 قهوجو قهوجو كى بنه ز نهغه هيا برنداره
 siv, pommé
 ز باغان حيا باغان با زانا نهغه ميني سى سى
 شاخان کا فالهوه بودنكى تى درکىتارا
 chagan pour chakhan
 branche
 مالا ميره اغان
 (agan, n pour l'arime)

دشا خالتا بديه شينه قاره جى مالا
 ميره اغا قهوجو ديكورينه لولو قهوجو جى
 لولو خوديك قهوجو كى ز نهغه هيا برينه
 بىنى ميره نهغه هيا نو شينه
 kawya agnan duran
 heghedji agnan duran
 biri - birin tonde
 لولو كا فیر کیر لولو نى هوكیچ پیر
 gouhouri changez keti pour
 hourik, paitel
 عونا كى هوركا كته برين زنده كو هورو
 دوقت هيا بيدا دو هوشه ز مينا نده نهغه

KURD 49, wr. 24b